Lê hikûmeta Iraqê peymana 11ê Adara 1974an bi cih neanî, hinek beşên vê peymanê guhert, hinek beşên wê qebûl nekir û yasaya otonomiya bisînor derxist.

Peymana 11ê Adara 1970î weke serkeftineke Kurdistanê kete dîrokê.

- Pîrsa Kurd jî wê di Destûra Demkî ya Iraqê de cih bigire.

- Di Destûra Bingehîn de jî wek neteweya Erebiyê wê neteweya Kurd jî were naskirin.

- Gelê Iraqê wê ji du neteweyên sereke, neteweyên Erebiyê û Kurd pêk were û di çarçoveya yekparçeyî ya Iraqê de, mafên neteweyî yên Kurdan jî di destûrê de cih digirin.

- Zimanê Kurdî li gel Erebiyê wê bibe zimanê perwerdeyê li

herêmên ku piranî Kurd lê dijîn.

- Cîgirê serok wê Kurd be.

- Ji bo Kurdan otonomî wê bê dayîn.

- Kurd wê beşdarî hikûmetê bibin û cudahî di navbera Kurd û Ereban de nebe.

- Kurd di warê perwerdehiyê de zehmetiyan dikişand, ji ber ku berê hatibûn dîrxistin. Ji ber vê yekê wê plansaziyek ji bo çareserkirina pîrsgirêkê were çekirin.

- Ji bo herêmên xweser wê serjimariyek bê kirin.

- Xwendekarên ku ji ber tundiya li herêma xwe ji dibistanan hatin îxracîkirin an jî neçar man xwendina xwe biterikînin wê karibin vegerin.

- Wê giranî li ser weşandina bernameyên Kurdî di televizyona dewletê de bê kirin.

- Qebûlkirina xwendekarên Kurd ji bo zanîngeh û peymangehan; Wê ji wan re derfet werin peydakirin ku hem li hundur hem jî li derveyî welat bi rêjeyek adil perwerdehiyê bistînin.

- Rêveber û fermanدارên yekeyên îdarî ku piranî Kurd in, wê kurd bin yan jî kesên ku baş bi Kurdî biaxivin bin.

- Kurd wê karibin vegerin ser ax, zevî û cihên xwe yên berê.

- Bicihanîna yasaya çaksaziya çandiniyê li Kurdistanê wê bileztir bibe, pêwendiyên eşîrî bîr çareserkirin û rêkeftin bîr kirin ku zeviyên guncaw ji bo hemû cotkaran bê dayîn.

- Miletê Kurd wê li gorî nifûsa xwe li gorî nifûsa Iraqê beşdarî rêveberiya yasayî bibe.

**PeyamaKurd**

## 'AKP'ê hişt ku li Rihayê li devê çeman xanî bîn lêkirin'

Parlamenteerê HDP'ê yê Rihayê Omer Ocalan destnîşan kir li Rihayê, mixabin destûr hat dayîn ku li ber çeman xanî bîn lêkirin û got: "AKP'ê, di nava 21 salan de hişt ku li ber çeman xanî bîn lêkirin û kesên li der û dora xwe pê dewle-



mend kirin." Ji şevê din heta niha li Riha û Semsûrê baraneke zêde dibare. Ji ber barana zêde li gelek deveran lehî rabûn. Di encama lêhiyê de li du bajarên 10 kesan jiyana xwe ji dest daye. Niqaşa li serdayîna destûrê ji bo lêkirina avahiyan li cihên divê ku neyên lêkirin, bi taybetî piştî erdheja 6'ê Sibata gur û geş bû.

Parlamenteerê HDP'ê yê Rihayê Omer Ocalan têkildarî mijarê ji ANF'ê re axivî. Ocalan anî ziman ku feraseta şaredariyên AKP'ê ji xapandinê tiştêkê din nîn e û got: "Tiştê ku AKP li ser navê rêveberiyên xwecihî û şaredariyanîyê li Kurdistan û Tirkîyeyê dike, ji xeynî xapandinê tiştêkê din nîn e. Tevî penaberan nifûsa Rihayê zêdeyê 3 milyon e, mixabin pîrsgirêka bînesaziyê li bajêr heye. Bînesazî, li gorî nifûsê nehatiye çekirin."

Omer Ocalan destnîşan kir ku ji van tiştên diqewimin re nabe ku mirov bibêje felaketa xwezayî ye û wiha got: "Mixabin bajarê me ber bi felaketê ve hat birin, nabe ku mirov ji vê re bibêje felaketa xwezayî. Hişkesalî li Rihayê heye, dibe ku şilî pir bariyabe, lê heger mirov tevdiran li gor teknolojiya sedsala 21'ê bigire, mirov wê rû bi rûyê felaketên wiha nebe. Li Rihayê, mixabin destûr hat dayîn ku li ber çeman xanî bîn lêkirin. Hem li Karakoprûyê hem jî li Eyyûbiyeyê û Halîliyyeyê divê hin cih vekirî bûna û rê li ber hin çeman vekirî bûya. AKP'ê, di nava 21 salan de hişt ku li ber çeman xanî bîn lêkirin û kesên li der û dora xwe pê dewlemend kirin."

Şaredariya Rihayê, bi kesên nelayiq hatiye tijekirin û şaredariyê îflas kiriye. Ji ber ku xebatên bînesazî û sere-saziyê bi laiyê û bi awayê ku divê nekirine, niha li Rihayê felaket e."

**anfkurdi.com**

## Nêçîrvan Barzanî: YNK û PDKê li ser gelek mijarên derbarê hilbijartinan de li hev kirine

Serokê Herêma Kurdistanê careke din daxwaz ji YNKê kir ku vegere nav hikûmetê û çareserîya pirsgrêkan li wê derê bibîne û li ser civînên dezgehên hilbijartinan jî got, "Lijneyên hilbijartinê



yên her du alîyan li ser gelek mijaran civiyane û li hev kirine, di vî warî de pêşketin hene."

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî îro Çarşemê 15ê Adara 2023an di 7emîn Foruma Silêmaniyê de ji Rûdawê re ragihand, "Civîna polîtîburoyên YNK û PDKê heta niha nehatiye diyarkirin lê dezgehên hilbijartinan ên her du alîyan civiyane û bi giştî li ser çawanîya lidarxistinê hilbijartinan li hev kirine. Ez dibêjim ku di vî warî de pêşketin heye."

Nêçîrvan Barzanî li ser vegera tîma YNKê bo nav Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî got, "Pirsgrêk ewqasî ne mezin in ku neyên çareserîkirin. Bi bawerîya min divê tîma YNKê vegere nav hikûmetê, eger pirsgrêk hebin dikarin di hikûmetê de gotûbêjan bikin û çareserîya hemû pirsgrêkan bibînin."

Nêçîrvan Barzanî peywendiyên niha yên Herêma Kurdistanê û Bexdayê wek "baş" bi nav kir û got, "Piştî salan cara yekê ye ku hevtêgihîştîneke nivîskî di navbera hemû aliyên hikûmetê de heye, tiştê ku em dibînin ew e ku li Bexdayê ji bo cîbicîkirina vê rêkeftinê cidiyetek heye. Ji ber vê yekê em bi hêviyekê li cîbicîkirina vê rêkeftina ku me li gel alîyan kiriyê dinêrin."

Nêçîrvan Barzanî berê di duyemîn Foruma Hewlêrê de 2ê Adara 2023an di gotûbêjê de taybet a bi sernava "Pirsgrêkên sereke yên Rojhilata Navîn û paşeroja Herêma Kurdistanê" de axivî û li wir jî got ku ew bang li Cîgirê Serokwezîr Qubad Talebanî û tîma wezîrên YNKê dikim ku vegerine civînên Encûmena Wezîran û di civînan de pirsgrêkên xwe çareser bikin.

Nêçîrvan Barzanî îro Çarşemê ji bo beşdariya heftemîn Foruma Silêmaniyê gihîşt Silêmaniyê û ji aliyê Cîgirê Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Qubad Talebanî ve hat pêşwazîkirin.

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî di heftemîn Foruma Silêmaniyê ya bi dirûşma "Piştî 20 salan, Iraq û herêm di nava pirsgrêkên nû yên cîhanî de" ku ji aliyê Enstîtuya Lêkolînên Herêmî û Navdewletî (IRIS) ve hatibû organîzekirin, gotarek pêşkêş kir. Rûdaw

## 13. Festîvala Azadî û Newrozê li Hewlêrê destpê dike

13. Festîvala Azadî û Newrozê ku wê çalakîyên curbecur bîn lidarxistin, îro li Hewlêra paytext destpê dike.

Hewlêr di 11ê Adara 1991ê de bi piştevanîya Hêzên Pêşmerge ji destê rêjîma Baas hat rizgarkirin. Herwiha salroja Peymana 11ê Adarê ye ku di sala 1970ê de di navbera serkirdayetiya siyasî ya Kurdistanê û hikûmeta Iraqê de hat îmzekirin. Vê peymanê hikûmeta Iraqê mecbûr kir ku bi saya serkeftina Şoreşa Îlonê ya bi serokatîya Mele Mistefa Barzanî mafên Kurdan nas bike.

Cejna Azadî û Newrozê bi salan e li Hewlêra paytext tê pîrozîkirin, ji ber ku 11ê Adarê di dîroka Kurdan de cihekî girîng digire.

Parêzgarê Hewlêrê Omêd Xoşnaw di kongreyê rojnamevanî de ragihand, ew ê bi vekirina peykerê Xece Bawe ku sembola azadiya Hewlêrê ye, destpê bikin.

Qeymeqam Xoşnaw diyar kir, li festîvala îsal jî pêşandanên curbecur hatine zêdekirin û destnîşan kir, wê çalakîyên li ser çand, wêje, dîrok, xweza û werzîşê jî bîn lidarxistin. **PeyamaKurd**

## Jîyan û bi serhata Egîdê Qadirî

Egîdê Qadirî sala 1938-an li Gundê Seyîd Kotaniya Vediya Ermenistanê hatiye dinyayê, sala 1999-an li Bakûya Azerbaycanê rehma Xwedê dike.

Malbata Egîdê Qadirî di salên 1926-1927an de, piştî serhildana Şêx Seîd, ji ber zilm û zora Roma Reş tevî 1700 malbatên eşîra Brûka koçber dibin, mal û milkên xwe di cih de dihêlin û ji çemê Erez, derbasî Qafqasyayê dibin. Egîdê Qadirî, di sala 1938an de li Gundê Seyîd Kotaniyê li nehiya Vêdiyê ya girêdayî Komara Ermenistanê ji dayik bûye.

Qadirî di sala 1963an de, li Zaningeha Pedagojîyê ya ser navê X.Abovyan li bajarê Erivanê, Fakulîteya ziman, wêje û dîrokê (para Azerî) xelas kiriye. Qadirî li bajarê Bakuyê di dibistanê de wekî dersdar kar kiriye û bi afirîneriya edebiyata Kurdî re mijûl bûye. Helbestên wî di salên cuda cuda di rojname û berevokan de ronayî dîtine.

Di sala 1971ê de pirtûka xwe ya bi navê "Lîrîka Helbestên Feqiyê Teyran" weşandîye. Ev, pirtûka wî ya yekemîn e.

Di pirtûka wî ya bi navê "Kûlîlken Çiya" de; hesret, nalfîn, gazî, guman, rastî, hêvî û bawerîya azadiya Kurdistanê heye. Ev bawerî pey nasbûna pirtûka "Kûlîlka Çiya" bi zimanekî şîrîn, xweş û poetîk ve, bandoreke mezin li ser xwendevanan jî çêdike.

Egîdê Qadirî di sala 1999an de, li bajarê Baku'yê çû ser dîlovanîyê.

## GULÎZER

Gerdana te şemdan dide, Gulîzer,  
Bejn û bala te heykel e sîm û zer,  
Ji hûba te bûme bengî sewdaser,  
Dev lêvê te şekrê şamê, Gulîzer.

Sûretê te sor gevez ça hinar e,  
Xal xetê te tev de nexşê guhare,  
Evîna te ez kirime dîn û har,  
Dîn û harê te gulê me, Gulîzer.

Naz horînga nûr şemdana qudrêtê,  
Sûlavlêka li ser banê cinetê,  
Min re were rehm û kerem mirwetê,  
Birîndarê te gulê me, Gulîzer.

Gulîzercan çavê te yê nexşîn in,  
Hinarê te merxik gulava bin in,  
Bengî ez im ser te maşuq evîn im,  
Evîndarê te gulê me, Gulîzer.

Ez dizanim tu bedewa kurdan î,  
Tacê zêrîn beyta Feqiyê Teyran î,  
Zîna bedew hûba Ehmedê Xanî,  
Dilxedarê te gulê me, Gulîzer.

Ez heyrana kenê te yê şekirî,  
Nûr nêdera dêmê te yê vekirî,  
Ji hûba te pir nexweş e Qadirî,  
Tengezarê te gulê me, Gulîzer.

## EŞ Û JAN

Şev e, dîsa xew nakeve çavê min  
Ah û zar im, alav digre dilê min  
Dişewîtim, diperîtim dil û çan  
Ev eş û jan te daye min, Kurdistan.

Bedew rindî, gulistana rengînî  
Bona Kurda timî, her wext şîrîn î.  
Ez çi bikim, dilê me de birînî  
Birina dil te daye me, Kurdistan.

Dinê zane bax û baxçe te rind in  
Çar aliyê te temam bajar û gund in  
Çiyayên te ji hemû çîyan bilind in  
Evan çiyana te dane me, Kurdistan

Bê welatî zehf derdekî giran e  
Bindeştiya te me re eş e û jan e  
Şev û roja Kurda ax û eman e  
Ax û elem te daye me, Kurdistan.



Ereb, Farsa, Tirkê decal zulmkara  
Kurdistanam hildan kirne çar para.  
Talan kirin, wêran kirin deşt-zozan  
Ev talanî bonam derde, Kurdistan.

Qadirî bes e, bişewîtî, binalî  
Bona Kurda, Kurdistanê bedhalî.  
Agadar be, pey tariyê rona ye  
Nêt mereme temam Kurda ev şa ye.

## E z ê B ê m

Weki ez mirim û çûm  
Tirba sar da cîwar bûm  
Kete çavê xwelî û qum  
Xema neke yara min  
Tu bizanibe ezê bêm.

Tu cara tu negirî  
Gulîya zirav vegirî  
Li ser tirbam bibi sî  
Hêviya min be her demê  
Tu bizanibe ezê bêm.

Wekî hat bahara al  
Neke axîn nalenal  
Hêviya min be karxezal  
Weki bû xûşînya cem  
Tu bizanibe ezê bêm.

## ENKSê ji bo salvegera serhildana 12ê Adarê û Roja Şehîdên Kurd peyamek belav kir

Encûmena Niştîmanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) îro Yekşemê 12ê Adarê, ji bo salvegera Serhildana 12ê Adara 2004an û Roja Şehîdên Kurd li Rojavayê Kurdistanê, peyamek belav kir.

Sekreterîya Giştî ya ENKSê di peyama xwe ya Serhildana 12ê Adara 2004an û Roja Şehîdên Kurd de ragihand, "Îro 19 sal di ser serhildana 12ê Adara 2004an a pîroz re derbas dibin ku hêzên rejîma Sûriyê komkujiyeke hovane li dijî gelê me yê Kurd li Sûriyê pêk anî, weke êrîşeke pêşîlêgirtinê li dijî têkoşîna netewî ya Kurd, ew jî piştî pêşketinên wê demê yên li herêmê, piştî rûxandina rejîma diktator a xwînrêj li Iraqê û ji bo çêkirina nakokîyan di navbera gelên gelên Erebb û Kurd de."

ENKSê diyar kir: "Rêjîmê sûde ji lîstika futbolê ya di navbera her du tîmên Qamişlo û Dêrezorê de wergirt û bi guleyên rasterast li ciwanên Kurd ên li stadyumê reşandin. Her wiha roja din jî di dema merasîma oxirkirina şehîdan de, hejmara şehîdan zêdetir bû ku û ev yek bû sedema derketina serhildana gelê Kurd li hemû deverên Kurdan li Sûriyê, ji Dêrikê heta Efrîn, Heleb û Şamê."

ENKSê got: "Gelê Kurd di dîroka têkoşîna xwe de, bi riya serhildan û şoreşan, qurbanîyên giran ji bo azadiyê dane, ji wan jî şehîdên Serhildana Adara 2004ê ku xwîna wan a pak bû handereke mezin ji bo tevgera rizgarîxwaz a Kurd li Sûriyê û ji bo pêşketina doza Kurdî ku derbasî qonaxeke nû ya têkoşînê li Kurdistanê Sûriyê bû û pirsgrêka Kurd ji çarçoveya xwe ya herêmî ya teng ber bi asoyên navneteweyî ve bir û xiste rêza mijarên girîng ên Rojhilata Navîn."

Di peyamê de hat diyarkirin: "ENKSê ev roj ji bo şehîdên Kurd li Kurdistanê Sûriyê ji bo rêzgirtina li xwîna

wan a pak hilbijart. Bila ev roj wek navekî girîng di dîroka gelê me û doza wî ya niştîmanî de bimîne, ji ber ku şehîd pira ku karwanên azadiyê di ser re derbas dibin e."



ENKSê destnîşan kir: "Di vê boneya bi eş de, ENKS tekezî li ser pêwîstiya yekdemî û yekhelwestiya Kurdî li hember pirsên niştîmanî, çarenivîs û daxwazên gelê me yê Kurd dike û ew berdeyam e di berevanîkirina li hebûna xwe ya resen li Sûriyê û mafên xwe yên çarenivîsaz ên rewşa di Sûriyayeke federal, demokrat, firehnetew û firehol de ku mafên hemû pêkhateyên gelê Sûriyê di destûra wê de parastî bin."

Di dawîya peyama ENKSê de erdheja wêranker a 6ê Sibata borî li Bakur û Rojavayê Kurdistanê, Tirkîye û Sûriyê hatiye bibîrxistin û hevxiyê xwe ya kûr bi gelên Sûriyê û Tirkîyê re û bi taybetî bajarên Efrîn û Cendîrsê re nîşan dide. Herwiha dîlovaniya ji şehîdan re û başbûna bilez jî ji birîndaran re hêvî dike. **PeyamaKurd**

## Bûbê Eser! Ez Cahda xwe ji Beriya Mêrdînê, Dêrika Çiyayê Mazî û Çiyayên Barzan Tînim

Di roja 21/2/2023, 24 sal di ser banga Saziya UNESCO, ku 21ê Sibatê ji her salê "Roja navnetewî ya Zimanê Dayikê" be, derbas bû. Bi vê helkeftinê

Bûbê Eser xwediyê van pirtûkên giranbuha: Barzan digirî, Gardiyan, Dîroka Rûreş, Qêrîna Barzan, Enfal û Jenosîd.. Berî çend salan dema ku min pirtûka

dar be, ne pêkan e ku mirov bikaribe ewqasî binivîsîne û hema bêje di derheqê piraniya meselan de me û gelê xwe agahdar bike. Belê ev camêrê ku ez behsa wî dikim brêz Konê Reş e. Min û wî me hevdu sala 2008an li festival Cegerxwîn de li Hewlêrê hev dîtibû, ez û brêz Konê Reş jî vexwandibûn wê festîvala ku me hevdu li wir nasîn. Me bi hev re gelek caran dûr û dirêj sohbetên xweş kirin. Me bi hev re wêne kişandin û mala wî ava be carna bi belavkirina wan wêneyan ew wan rojan tîne bîr min. Ez wê demê bi nasîna brêz Konê Reş gelekî kêfxweş û şad bû bûm. Lê min nizanî bû ev camêr deryayek ji derya wêjeya kurdî û xebatkare wê ye. Heger ew ne evîndarê edebiyata xwe ba, wê nikarîba ewqasî binivîsînda. Wê nikarîba hemî şev û rojên xwe ji bona vê xebatê terxan bikira. Brêz Konê Reş bi hebûna te dilê me xweş, çanda me geş dibe. Bila tu her hebe û vê xebata tu ji bona gelê xwe dike berdewam bî. Heger îro ev xebatana neyên dîtin dê sibê, li her çar perçên Kurdistanê gelê te xelkê te, dê behsa te bikin). Serbilindî û şanazî ev e û te ev bi xebatên xwe yê hêja kire malê xwe. Loma careke din te pîroz dikim ku tu ewqasî ji gelê xwe, ji edebiyata wî û ji hebûna wî hez dike).

Mamoste Bûbê Eser! Ez vê cahda xwe ji wan kesên ku bi zimanê Cizîrî, Xanî û Mîr Celadet Bedirxan diaxifin tînim, ji daxwaza xelkên Qamişlo û Amûdê, Amedê û Sêrtê, Zaxo û Duhokê, Ormiya û Mehabadê ku azad û serbest bijîn tînim.. ji hisreta wan lehengên ku xwîna xwe di ber azadiya welat de rijandin tînim, da ku careke din berfa li ser çiyayê Agirî, Cûdî, Barzan û Pîremegrûn û Dêrika Çiyayê Mazî bi xwîna sor nebe, tînim.. Erê birako! Da ku keç û xortên vî welatê birîndar bi aşî û aramî bijîn û her yek li ser Memê xwe, Siyabendê xwe, li ser Zîna xwe, Xeca xwe stranên bibêjin û Edûla Temir Paşayê Millî, bê tirs li ser Derwêşê Evdî binihirîne.

Erê, ez hêz û cahda xwe ji gul, kulîlk û nêrgizên Kurdistanê distînim, ewên ku ji zimanê dayka min û te fam dikin, ewên ku, ez û tu û wan bi yek şûrî dikevin û bi yek şûrî radibin, ewên ku ne ji wan be ez tu tine ne û em û hebûna xwe di hebûna wan de dibînin.. Erê birako!! Ez cahda xwe ji Beriya Mêrdînê, Dêrika Çiyayê Mazî û Çiyayên Barzan tînim.

**Konê Reş**



min careke din ew gotarê ku nivîskar Bûbê Eser, bi navê: (Konê Reş vê cahdê ji ku tîne?), nivîsandibû, xwend.. Bi xwendinê re, ez pêre pêre li bajarê wî Dêrika Çiyayê Mazî, vegeryam; Qedrî Can -nûxuriyê kovara Hawarê- û herdu nivîsên wî, di hejmarên 1-2/ 1932an de ku, dûrbûn û bêrîkirina xwe ji Dêrikê re diyar dike û Apo Osman Sebrî lê vedigerîne, di ber çavên min re derbas bûn.. Ev gotina ku Cegerxwîn di Jînenîgariya xwe de wiha pesnê Dêrika Çiyayê Mazî daye hat bîra min: "Bi rastî jêderê rîstevaniya min, Dêrik (Şebextan) bû; jêder peyxa û pêşveçûna torevanî û rîstevaniya min bû. Wê, jîn, evîn û vîn raçavî min kirin. Wê, ez ji kuncê xwendegehên olperesî dûr xistim. Wê, ez ji tarîstana hovîtî, nezanî derxistim û gihandim gulşena mirvperwerî; jîna civakî, bi min pîroz kir..". Û gelek tişt û miştên din ku bi Dêrikê ve girêdayî ne hatin bîra min, wek navên wan malbatên kurd yên ku di Beriya Mêrdînê de dijîn û bi navê Dêrikî an Dêrî didin naskirin. Ew jî di ber çavên min re derbas bûn û min di dilê xwe de got; xwazî carekê, min serdana Dêrika Çiyayê Mazî kiriba.

Dêrika Çiyayê Mazî; ev bajarokê biçûk yê ku têr welatperwer û rewşenbîrên pêşeng e; di serê wan de Qedrî Can bavê helbesta kurd ya nûjen, Reşîdê Kurd, Elyas Efendî, Edip Karahan xwediyê rojnameya Dicle-Firat û.. û nivîskar û romannivîs

wî (Barzan digirî), xwend, niqutî dilê min ku ez gotarekê bi navê: (Jana ji Dêrika Çiyayê Mazî ta Çiyayê Barzan), binivîsim, lê sed mixabin ji ber rewşa awarte nesîb nebû.. Va îro bi min xweş e ku van gotinan dinivîsim.

Bûbê Eser; yê ku salên dirêj ji temenê xwe di zindanan de derbas kiriye.. Min û wî sê caran hev dîtiye; cara pêşî di festival Cegerxwîn de bû li Hewlêrê, sala 2008an, cara duduyan di Festîvala Feqeyê Teyran de bû li Wan û Miksê, sala 2010an û cara sisyan di Festîvala Duhokê ya Rewşenbîrî/5 de bû, sala 2022an. Di van hersê caran de, em ji hev qut nedibûn û ji hev têr nedibûn..! Dawî, ew vedigeriya Swêda xwe û ez vedigeriyam Qamişloka xwe.. Erê birako! Ew jî ji Dêrika Çiyayê Mazî ye. Fermo gotarê mamoste Bûbê Eser bixînin:

(Konê Reş vê cahdê ji ku tîne? Heger mirov ne hezkirê yekî/ê be mirov nikare herroj behsa wî/ê bike. Ji ber vê ye hezkirin tişteki xwe zayî ye. Ne ku mirov bi zorê an jî ji bona berjewendiyekê jê hez dike. Mirov dil digire û her ku dihare ew dildariya mirov li hember hezkira/ê me re zêdetir dibe. Naxwasim zêde bi dirêjayê behsa evîn û evîndariyan bikim. Ji xwe her kes vê dizane. Mesela min û mijara vê nivîsê ev e ku vî camêrê evîndarê zimanê xwe, welatê xwe û hêjayiyên gelê xwe, çawa dikare ewqasî behsa wan bike û li ser wan binivîsîne. Heger mirov ne evîn-

## "Destkeftiyên Kurdistanê ji berhema xebata Barzaniyê Nemir in"

14 adarê Îro 120 saliya jidayîkbûna Barzaniyê Nemir bavê ruhanî yê neteweya Kurd e, Pêşmergeyên herdu şoreşên Îlon û Gulanê jî dibêjin, pêwîst e û erk e jî ku hemû Kurdek li ser rêbaza pîroz a Barzaniyê Nemir berdewam be ji bo ku Kurd bighên hemû mafên xwe, ji ber ku ew destkeftên niha berhema xebata Barzaniyê Nemir in.



Pêşmergeyê herdu şoreşên Îlon û Gulanê Sidîq Goran ji malpera fermî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê KDP.info re ragihand: "Îro 120 sal bi ser jidayîkbûna Barzaniyê Nemir bavê ruhî yê neteweya Kurd derbas dibe, ku rojeke geş e ji bo Başûrê Kurdistanê. Ji bo herçar parçeyên Kurdistanê rojeke geş e, ji ber vê yekê divê em hemû li ser rê û rêbaza pîroz a Barzaniyê Nemir berdewam bin û em xizmeta vê rêbazê bikin, heya ku em bigihin hemû daxwaz û mafên xwe yên ji ber ku Barzanî dibistanek bû ji bo hemû parçeyên Kurdistanê."

Sidîq Goran wiha got: "Barzaniyê Nemir serkirdeyekî netewî û niştimanperwer bû û ti cudahî nedikirin, xwe pêşmerge dihesiband û li kêleka Pêşmerge xebat dikir, jiyana wî jî ji ya Pêşmergeyan cuda nebû û hertim xizmeta gelê Kurd dikir. Ez bi xwe jî gelek caran pê re rûniştîme, li Nexde û li Kerec û li Qesrê. Gelekî vekirî bû û herdem em şîret dikirin û digot li ser xebatê ji bo mafên gelê Kurd berdewam bin. Niha jî mezintirîn destkeft ji bo gelê Kurd bi dest hatiye peyman 11ê Adara 1970ê ye ku ez endamê rêxistina partiyê bûm û ez 23 salî bûm, lewma ew peyman baş tê bîra min."

Wî pêşmergeyê dêrîn wiha got: "Divê em hemû li ser vê rê û rêbaza pîroz berdewam bin û helbet destkeftên me ji berhema xebat û têkoşîna Barzaniyê Nemir in, lewra niha bîyî Serok Barzanî û vê rêbazê dê çareserîkirina kêşeyan zehmet be, ji ber wê jî pêwîstiya me bi vê rêbazî her heye ji bo ku em hemû mafên gelê Kurd bidest bînin."

Ji aliyê xwe ve, pêşmergeyê herdu şoreşên Îlon û Gulanê Ebdulqadir Mihemed Mensûr ji malpera fermî ya Partiya Demokrata Kurdistanê KDP.info re ragihand: "Em hîn li ser rêbaza pîroz a Barzaniyê Nemir in. Erkê me ye ku em wek Barzanî ligel hejar, cotkar, karker û hemû çînen din bin. Divê em hertim pêbendî vê rêbazê bin, ji ber ku xebata Barzanî hertim ji bo bidestxistina mafên gelê Kurd bûye."

Wî pêşmergeyê dêrîn wiha got: "Destkeftên niha ji berhema têkoşîna Barzaniyê nemir in, ji ber wê jî erkê me ye ku em heman rê û rêbazê bişopînin da ku destkeftên zêdetir ji bo gelê Kurd bidest bixin, ji ber ku wê demê Qazî Mihemed ji Barzaniyê nemir re gotibû ezê bêm bidarvekirin û Ala Kurdisatanê da Barzaniyê Nemir. Barzaniyê Nemir yê hemû perçeyên Kurdistanê bû, ne tenê Başûrê Kurdistanê."

Ebdulqadir Mihemed Mensûr wiha got: "Em beşdarî hemû şoreşan bûne û şoreşên bi serokatiya Barzaniyê Nemir hemû ji bo bidestxistina mafên gelê Kurd bûne û piraniya destkeftan bi destên nemir Barzanî hatine bidestxistin."

**KDP.info**

## Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî li Efrînê firûna nan vekir

Berpîrsê Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî (BCF) yê ofîsa bajarê Efrînê yê Rojavayê Kurdistanê ragihand ku li Efrînê ji bo mexdûrên erdhejê firûna nan dest bi kar kiriye. Berpîrsê BCFê Rewac Hacî, ji K24ê re daye xuyakirin ku di çarçoveya

alîkariyê Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî bo ziyandîtiyên erdhejê yên herêma Efrînê de, wan firûneke nan vekirîye ku dê rojane bi 4 ton ard nan bipêje û li xelkê Efrînê belav bike.

Rewac Hacî daye zanîn ku vekirina firûnê ji bo Efrîniyan

gelekî girîng e û wan ew firûn bi rêya muxtaran û berpîrsên şaredariyên herêmê vekirîye. Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî, ji destpêka erdhejê 6ê Sibatê ve li Bakur û Rojavayê Kurdistanê alîkariyên xwe berdewam dike.

**PeyamaKurd**

## Di ser Komkujiya Helebce re 35 sal derbas bûn!

Roja 16ê Adara 1988an, Komkujiya Helebce ye. Li Helebce 35 sal beriya niha, li ber çavên hemû cîhanê, rejîma Beis a Iraqê, di dîroka mirovahiye de deqeke reş û tu caran ji bîr nabe nexşand; tawaneke mirovahiye pêk anî. Di 16ê Adara 1988an de, desthilatiya Beisê û Sedam



Hîsên, bi çekên kîmyewî û biyolojîk, jin û zarok û kalemêr û pîrejin, ji 5 hezarî zêdetir Kurdên Helebceyî, qetil kirin.

Di ser Komkujiya Helebce, ya ku di dîroka mirovahiye de bûye deqeke reş û tu caran ji bîr nabe re, 33 sal derbas bûn. Komkujiya Helebce ya ku di şexsê gelê Kurd de, li hemberî mirovahiye û hemû nîrxên mirovahiye pêk hatiye, wekî sûcê mirovahiye di nava rûpelên dîrokê de cihê xwe girtiye.

Gelê Kurd, ku ji bo xîreta xwe ya neteweyî dîtkeşe, êşa bi dehan komkujiyan, bi hovîtiya Helebce di kûrahîya dilê xwe de jiya.

Rêveberiya Beisê her hewl da ku li Başûrê Kurdistanê û Iraqê têkoşîna azadiyê û mafên gelê Kurd ên yeksanî û self-determinasyonê gellek caran bi rêbazên terora dewletî û zext û zordariyê zêft bike, lê bi vê komkujiyê jî ew daxwazên gelê Kurd tîk nebî. Piştî vê komkujiyê, li ser xaka Hikûmeta Herêma Kurdistanê ya li Başûrê Kurdistanê, têkoşîna gelê Kurd, bi destkeftiyên nû bi pêş ve çû. Dîrokê car din êşkere kir, bi rêbazên zext û zorê têkoşîna ji bo demokrasî, azadî û yeksanîyê, herçend di demeke kurt de bête têkbirin jî, rê li ber nayê girtin. Çi çekên kîmyewî çî biyolojîk çî ji konvansiyonê, çî dibe bila bibe, bi komkuji û tundûtûjiyê, têkoşîna ji bo azadiyê nayê rawestandî.

**PeyamaKurd**

## Amerîka: Yekane rêya girtina kampên DAIŞê li Rojava...

Berdevkê Wezaretê Derve ya Amerîkayê Ned Price diyar kir, yekane rêya girtina kampên ku endamên DAIŞê û malbatên wan li Rojava lê ne, ew e ku dewlet welatîyên xwe paşve wergerin û ji bo vê yekê jî em her tiştî dikin.



Di civîna çapemeniyê ya rojane de Price bersiv da pîrsa derbarê daxuyaniya Fermandarê Hêza Navendî ya Amerîkayê (CENTCOM) General Michael Kurilla ku di serdana xwe ya Sûriyeyê de dema ku serdana Rojava kiribû û gotibû, ji bo kampên rêxistina terorîst a DAIŞê çareserîya leşkerî tune. Nûçegihanekî daxuyaniya Orgeneral Kurilla bi bîrxist û got "Wezaretê Karên Derve ji bo valakirina van kampên çî dike?" Price bersiv da pîrsê û got: "Em bi welatên li çaraliyê cîhanê re diaxivin ku tekane çareserîya domdar şandina wan bo welatên xwe ye. Em spasîya gelek welatan dikin ku hemwelatîyên xwe ji kampên navborî, di van rojên dawî de, ji nû ve qebûl kirine. Em di wê baweriyê de ne ku ev yekane rêya rûbirûbûna vê diwariyê ye. Buroya me ya dij-terorê û ofîsên me yên herêmî li cîhanê geriyên û ji bo kêmkirina hejmara girtiyan (ji kampên li Rojava) û girtina van kampên bi berpirsîyarî her tiştî bikin."

Mirov wê di wan kampên de radîkaltir bibin. Nûçegihan got, "Xuya ye ku piraniya dewletan xema welatîyên xwe yên li wir nakin. Ma metirsî li ser wê yekê bi we re çênabe ku kesên di wan kampên de radîkaltir bibin û bibin sedem ku mîsyona Amerîkî li wir ji armanca xwe dûr bikeve?" Li ser pîrsê, Price bersiv da ku ev nîgeranî yek ji wan sedemên ku ew hewl didin ku nîfûsa li kampên bi awayek domdar kêmkirin. Herwiha Price da zanîn, "Hinek ji wan sedemên bi şert û mercên mirovahî ve girêdayî ne. Hin jî bi ji ber ku li wê derê ne radîkalîze dibin. Ev nîşan didin ku çima pêdivî ye ku dewlet bilez gavên bibiryan û wêrek bavêjin."

**PeyamaKurd**

## Nûnerê Rêzdar Serok Mesûd Barzanî Li Barzan Pêşewazîya Heyeta PAKê Kir

Heyeteke PAKê (Partiya Azadiya Kurdistanê) bi minasebata 120emîn salvegera jidayikbûna cenabê wî, li Barzan seredana ser mezelê rêberê mîletê Kurd Mele Mistefa Barzanîyê nemir kir.

Heyeta PAKê ji Cîhgirê Serokê Giştî yê PAKê û Berpirsê Başûrê Kurdistanê Rêzdar Orhan Kaya, endamê meclîsa partiyê ya PAKê Rêzdar Hamdusena Demîrel, endamê Komîteya Başûrê Kurdistanê ya PAKê Rêzdar Temo Ayas û ji endamên PAKê yên li Başûrê Kurdistanê pêk hatibû.

Rêzdar Şêx Xelat Barzanî yê Nûnerê Rêzdar Serok Mesûd Barzanî pêşewazîya heyeta PAKê kir.

Cîhgirê Serokê Giştî yê PAKê û Berpirsê Başûrê Kurdistanê Rêzdar Orhan Kaya li ser mezelê nemiran Mele Mistefa Barzanî û Îdrîs Barzanî axaftinek kir.

Ev jî teksta axaftinê ye:

"Em rêberê mîletê Kurd Mele Mistefa Barzanîyê nemir bigiramî bibîrtînin Mele Mistefa Barzanî yek ji rêberên neteweyî yê mîletê Kurd e.

Mele Mistefa Barzanîyê nemir di 14ê Adara 1903yan da jidayikbûye û di roja 1ê Adara 1979an koça dawî kirîye. Ango adara îsal, 120emîn salvegera ji dayikbûna wî û 44yemîn salvegera wêfata wî ye.

Jiyana Mele Mistefa Barzanî, bi şer, hefs, koçberî, surgun,



wêranî û bi trajediyên mezin ve dagirtî ye.

Ew aktor û şahidê gelek rûdanên dîrokî bû. Herweha jiyana Mele Mistefa Barzanî, bi xweşî û nexweşiyên xwe, bi welatperweriyê, bi xebat û têkoşîneke bêwestan, bi berxwedanê û bi sekneke bi biryardariyê ve hatiye hûnandin. Weke Serfermandarekî Artêşa Komara Kurdistanê (Komara Mehabadê) di avakirina Komara Kurdistanê de roleke dîrokî lehîstî ye.

Ew damezranêr û Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraqê ye.

Bi serokatîya Mele Mistefa Barzanî di 11ê adara 1970yê de bi Hikûmeta Iraqê re peyman a otonomîyê hatiye îmze kirin.

Mele Mistefa Barzanî, bi rêbaz û xebat û têkoşîna Şêx Abdulsalam Barzanî û Şêx Ahmed Barzanî û di medreseya welatperwerîya wan de perwerde bûye.

Têkoşîna Mele Mistefa Barzanî, berdewamiya rêbaza Rêxistina Azadî ya Xalid Begê Cibrî ye, ya Xoybûnê û ya Komara Kurdistanê ye. Ew berdewamiya doza Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî, Seyid Riza, Îhsan Nurî, Pêşewa Qazî Mihemed e.

Alaya Kurdistanê ya ku Pêşewa Qazî Mihemedî teslîmî Mele Mistefa Barzanî kir, tu carî li erdê neket. û ew alaya ku Mele Mistefa Barzanî teslîmî pêşmergeyên Kurdistanê kiribû, bi gelek êş û zilm û qetlîaman ve, lê bi têkoşîna pêşmergeyên qehreman, bi têkoşîna hemû kadarkên doza azadiyê, li Başûrê Kurdistanê îro bi awayekî serfirazî li ser Parlamentoya Kurdistanê li Hewlêrê li ba dibe.

Em di 120emîn salvegera jidayikbûna wî de, rêberê mîletê Kurd Mele Mistefa Barzanîyê nemir bi giramî bibîrtînin.

**14.03.2023 Orhan Kaya**

## Hêzên Esed rê nadin alîkarî derbasî taxên Kurdan bibin: Ji sedî 75ê wan dixwazin!

Hat ragihandin ku 25 kamyonên alîkariyê yên ji aliyê xelkê Silêmaniyê ve bo taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê hatine şandin, ji aliyê hêzên rejîma Sûriyê ve 6 roj in hatine astengkirin.

Li gorî çavkî niyên herêmê berpirsên rejîma Esed gotine, bi şertê ku dest deynin ser ji sedî

75ê wan alîkariyan ew ê destûrê bidin.

Heserokê Daîreya Ragihandinê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Ciwan Mele Îbrahîm jî ji medyayê re daye xuyakirin, ji 6 rojan ve hikûmeta Şamê alîkariyên ku ji Silêmaniyê ji bo mexdûrên erdhejê yên taxên

Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê şandine, li deriyê Tayihe yê di navbera Minbic û herêmên xwe de asteng kirine.

Li gorî çavkaniyên Şamê, piraniya alîkariyên ku ji bo Sûriyeyê re hatine şandin, negihîştine mexdûran û hêzên rejîmê dest datîne ser wan alîkariyan.

**PeyamaKurd**

## 'AKP'ê hişt ku li Rihayê li devê çeman xanî bîn lêkirin'

Parlamentêrê HDP'ê yê Rihayê Omer Ocalan destnîşan kir li Rihayê, mixabin destûr hat dayîn ku li ber çeman xanî bîn lêkirin û got: "AKP'ê, di nava 21 salan de hişt ku li ber çeman xanî bîn lêkirin û kesên li der û dora xwe pê dewlemend kirin."

Ji şevê din heta niha li Riha û Semsûrê baraneke zêde dibare. Ji ber barana zêde li gelek deveran lehî rabûn. Di encama lêhiyê de li du bajarên 10 kesan jiyana xwe ji dest daye.

Nîqaşa li serdayîna destûrê ji bo lêkirina avahiyan li cîhên divê ku neyên lêkirin, bi taybetî piştî erdheja 6'ê Sibatê gur û geş bû.

Parlamentêrê HDP'ê yê Rihayê Omer Ocalan têkildarî mijarê ji ANF'ê re axivî. Ocalan anî ziman ku feraseta şaredariyên AKP'ê ji xapandinê tiştêkê din nîn e û got: "Tiştê ku AKP li ser navê rêveberiyên xwecihî û şaredarîvaniyê li Kurdistan û Tirkiyeyê dike, ji xeynî xapandinê tiştêkê din nîn e. Tevî



penabaran nîfûsa Rihayê zêdeyê 3 milyon e, mixabin pîrsgirêka bînesaziyê li bajêr heye. Bînesazî, li gorî nîfûsê nehatiye çekirin."

Omer Ocalan destnîşan kir ku ji van tiştên diqewimin re nabe ku mirov bibêje felaketa xwezayî ye û wiha got: "Mixabin bajarê me ber bi felaketê ve hat birin, nabe ku mirov ji vê re bibêje felaketa xwezayî. Hişkesalî li Rihayê heye, dibe ku şilî pir bariyabe, lê heger mirov tevdiran li gorî teknolojiya sed-sala 21'ê bigire, mirov wê rû bi rûyê felaketên wiha nebe. Li

Rihayê, mixabin destûr hat dayîn ku li ber çeman xanî bîn lêkirin. Hem li Karakopruyê hem jî li Eyyûbiyeyê û Halîliyeyê divê hin cih vekirî bûna û rê li ber hin çeman vekirî bûya. AKP'ê, di nava 21 salan de hişt ku li ber çeman xanî bîn lêkirin û kesên li der û dora xwe pê dewlemend kirin.

Şaredariya Rihayê, bi kesên nelayiq hatiye tijekirin û şaredariyê iflas kiriye. Ji ber ku xebatên bînesazî û sere-saziyê bi layiqî û bi awayê ku divê nekirine, niha li Rihayê felaket e."

## Ez û Seîd Yûsiv û Dostaniya Me

## Konê Reş, Qamişlo

Di vê nivîsê de li dor dostaniya min bi hunermend Seîd Yûsiv re, bi min xweş e ku bi vê gotina Seydayê Cegerxwîn destpê bikim: Ger çi mîlet li wan camêran bi çavê kêm ji dinere û rûmeta wan nabîne, lê gerek e, em qenciya dengbêj û stranbêjan ji bîr nekin ku zimanê Kurdî bi pêş ve birine û ji mirinê parastine; ji pencê mirinê û nav lepên zimanên bêgane bi mîranî parastine. Lê mîletê Kurd, ji ber ku bi xwe nezan bû, nikarîbû rûmet û karên wan yê giranbiha nas bike.

Cegerxwîn, Jînenîgariya min, rûpel 83.

Ez jî, dengê xwe tev dengê Seydayê Cegerxwîn dikim û dibêjim: Eger şêx û melayên me karîbûn bi dîwana Melayê Cizîrî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî, helbestên Feqiyê Teyran, Nehcîlenama Mele Xelîlê Sêrtî biparêzin, Stranbêj û dengbêjen me jî yê wêk Şakiro, Kawis Axa, Karapêtê Xaço, Eyşe Şan, Mihemed Arîf, Îssa Berwarî û yê mayî zimanê me ji talan û bişaftinê parastin. Rola wan di parastina zimanê Kurdî de zor mezin bû. Bêguman di pey wan re Seîd Yûsiv e, yekî sereke ye di nav hevalên xwe de wek Aramê Dîkran, Mehmûd Ezîz, Mihemed Şêxo, Seîd Gabarî û hevalên wan yê din. Wî roleke mezin di parastin û pêşketina strana Kurdî de lîstîye. Tevî qedexebûna zimanê Kurdî di wî heyamî de.

Ji berî 10 salan ve, ji ber giringiya kar û xebata Seîd Yûsiv di ber peyv û muzîka Kurdî de, min navê wî jî -Yê tekane sax- wek stêrêkê, di nav her 33 navdarên Kurdan, yê mirî de, di pirtûka xwe ya bi navê "Ji Stêrên Welatê Qedexê" (Duhok 2013) de, nîşan kiriye, digel ku min wêneyê wî jî bi wêneyê wan re daxistiye ser bergê pirtûkê.

## Dostaniya Min û Wî

Ji mêj ve min Seîd Yûsiv nas dikir, belê ji sala 1978an û vir de, min ew ji nêzîk ve nas dikir. Di sala 1979an de, piştî ku mala xwe ji Beyrût û Şamê zivîrand Qamişloyê, dostaniya min pê re xweştir bû. Nexasim piştî ku di eynî salê de, wî şahiya zewaca min bi dengê xwe û tîlên tembûra xwe xweş û geş kir û wî ev dostaniya me dirêj kir ta ku ew çûye ber dîlovanîya Xwedê.

Di havîna 1980î de ji min re got Şivan Perwer hatiye Beyrûtê, ahengek ji kurdên Libnanê re lidarxistiye û nameyek ji min re şandiye, daxwaza dîtina min û tembûrêkê dike. Ma tu bi min re nayê, em herin? Min bi erênî besiva wî da û di roja 25/6/1980an de, bi balafirê ji balafirgeha Qamişlo (ez û wî û kurê wî Zoro yê ku hingê 10 salî bû), me berê xwe da Şamê û ji Şamê em çûn Beyrûtê mala bavê wî. Şivan jî, li Beyrûtê di mîvandariya welatparêzê Kurd Ahmed Cimhûr de bû. Di encamê de Şivan Perwer û çend kesên din pê re hatin mala bavê Seîd û me şevbuhêrêke dirêj, ta derengî şevê li mala bavê wî derbas kir.

Di nav roj, meh û salan de, dostaniya min û wî şêrîntir dibû. Dema ku li Qamişlo ba, min ser

jê qut nedikirin. Ji ber ku kesî wî li Qamişlo nebû; ne bira, ne pis-mam, ne pisêpismama û ne xaltîk, metik û xal. Min jî ev yek di ber çavên xwe re derbas dikir û rîzgirtinek mezin li gor huner û bêkesiya wî digirt û jê re digot (Xal), wî jî ji min re digot (Xwarzê).

Dema ku diya wî li Qamişlo çû ber dîlovanîya Xwedê, ew li Beyrûtê bû, wek neferekî malbata wî, ez jî digel zarokên wî bi wacibê şîna diya wî (taziya) rabûm. Herweha piştî çend salan bavê wî jî mir, cardî ew ne hazir bû, li Ewropa/ Avustriya bû, careke din ez bi wacibê şîna bavê wî rabûm. Xwedê heye; endamên Partiya Pêşverû li Qamişlo teksîr nekin, di serê wan de mamoste Abdulhemîdê Derwêş.

Li dor çavpêketina xwe bi Mîr Dr. Kamîran Bedirxan re, ji min re digot: Di sala 1972an de, dema ku Mîr Dr. Kamîran Bedirxan û kebanîya xwe ji Parîsê hat Beyrûtê, ez jî ligel kurdên Beyrûtê di pêşwaziya wî de bûm. Di rûniştinekê de bi Mîr Kamîran re, li mala Necîmê Îbrahîmê Hesên yê ku wê hingê



serokê Komeleya Kurdên Libnanê bû, yekî ji Mîr re got: Mîrê min! Seîd Yûsiv stranên netewî nabêje. Mîr lê vegeand: Kurê Min! "Strana Girê Sîra bi Sîr e" ew jî Kurdistan e.

Digel ku mamoste Seîd Yûsiv dengbêj û muzîkjen bû, wiha jî helbestvanekî stranan yê jîr û çeleng bû. Karîbû di kêliyêkê de gotinên stranekê bîafîrîne. Û gelek caran ji min re digot "Kes nikare di warê jenîna tembûrê, afirandina helbestên stranî û awazan de li pêşiya min bide".

Ez dikarim bibêjim ku tev stranên wî, ji bilî yê folklorî ji hunandina wî ne. Ew kaniya helbestên stranî bû. Li gor nîşê xwe, rewşenbîrêkî çak bû. Ji bilî zimanê Kurdî û Erebi hinekî bi zimanê Îngilîzî û Almanî jî zanîbû. Pirtûkxaneya wî ya malê bi baş pirtûkan dagirtî bû. Min pirtûkxane wek ya wî di mala hunermendan nedîtiye. Erê, piraniya stranên wî ji helbestên wî ne û dor 8 dîwanên helbestên wî hene. Ji dîwanên wî yê Çapbûyî: 1-Govenda Dilan 2-Rewşen 3-Sozdil û 4-Bedai Teelîm Alet Elbizî (Bedewiyên Fêrkirina Amûra Bizqê).

Seîd Yûsiv; Mirovekî hezxevekirî û sebûr bû. Xwedî bîr û bawerî bû. Serê xwe ji kesî re nedîtewand. Aşiqê navê Barzaniyê nemir bû. Çendî dixwest careke din bi daxwaz-nameyeke fermî serdana herêma Kurdistanê azad bike û strana "Kê dinya hejand.. Kê dolab gerand.. Ew Barzanî kak, rabû şûr kişand.." bibêje.. Lê sed mixabin ew xwesteka wî pêk nehat. Tevî ku gelek hunermendên Başûr xwe didan ber

mesrefa wî ku here, lê wî qebûl nedikir. Divîbû wek mêvanê Hikûmeta Herêma Kurdistanê, here Kurdistanê ku li serê stran gotine. Carekê hunermend Bilind Îbrahîm ji Duhokê hat serdana wî û li pêş min jê xwest ku serdana Kurdistanê bike û xwe da ber tev xerciya çûn û hatinê. Seîd Yûsiv qebûl nekir û jê re got; Spasiya te dikim, xerciya cûn û hatina min heye. Ez dixwazim bi rengekî fermî herim, wek mêvanê hikûmetê.

Dema ku li Qamişlo ba, an ji dûriyê bihata mala xwe li Qamişlo, zû bi zû ji mal dernediket ku ne bikar ba. Dost û nasên wî diçûn serdana wî. Deriyê mala wî vekirî bû. Xwedê heye; kebanîya wî Emîra Melûl jinek



mêvanhez, çavvekirî û merd bû. Bi beşîşandin pêşwaziya mêvanê Seîd dikir. Her ku mêvanên wî ji cihên dûr dihatin, ez agahdar dikim û dixwest bi wan re hazir bibim. Yê min jî, her ku mêvanekî minî xerîb bihata, min ew agahdar dikir û ez û mêvanê xwe diçûn serda wî. Kêfa wî dihat, kêfa mêvanê min jî bi naskirina wî dihat. Li min rehet dibû. Gelek caran taybetiyên xwe ji min re digotin. Carekê ji Beyrûtê telefon ji min re vekir û got; min bêriya te kiriye, ma tu nikare çend rojan bê Beyrûtê? Min bi erênî bersiva wî da û ez çûm. Carekê jî li



Qamişlo çûm serdana mala wî, min dît ku ew bi tenê ye, hin xaxet û maxet li ber destên wî ne, ji min re got: Xwarzê! Mêzeke evqas hunermendên Kurd ev stranên min gotine û listeyek bi nav wan stranan da destên min..

Ji stranên wî yê hezkirî Rewşê rewşê Rewşenê, Eman Cîhan, Şikrayê, Ey Newroz, Kê dinya hejand, Çava kilke, Hêstirên min dibarin, Kurdistan yan neman, Gundîno hawar, Ax ji kurbê bav û bira, Kurdistan pîr şêrîn e, Sebra li ber vî dilî, Ez nikarim rabim ji va derda.

Jixwe bi vê strana xwe hiştiye ku navê Qamişlo li ser zardevê her neferekî be ji kurdên Rojava û hezkirin û dîtina Qamişlo bi Kurdistanîyan şêrîn kiriye:

Qamişlo bajarê evînê, cihê

govend û civînê

Eger tu bixwe evîndarî, li wê dermanê birînê

Jiyana Seîd Yûsiv jiyanek hunerî bû, mişt kar û xebat bû. Wî 45 sal ji temenê xwe di ber peyv û muzîka Kurdî de xerc kir. Welatîyên wî jî, yê bîrewer û kesên ku bi nîrxê muzîkê zanin, keda wî di ber çavên xwe re der-



bas kirin û bêtir ji 20 caran ew hatiye xelat kirine.

Sebareti naznavê wî (Mîrê Bizqê) an Mîrê Tembûrê: Wek ku diyar e Mihemed Abdulkerîm, muzîkjenê Sûriyê, ewê bi bejna xwe kurt, ji bajarê Humsê bi navê Mîrê Bizqê/ Tembûrê naskirî bû, berî ku here ber dîlovanîya Xwedê di hevpeyvînek xwe de gotibû "Heta Seîd Yûsiv hebê Bizqê/ Tembûrê namire". Û li gor tembiya wî, Bizqa wî ya taybet ji bo hunermend Seîd Yûsiv bê diyarî kirin. Ji wê hingê ve Seîd Yûsiv di medya Erebi û kurdî de bi navê Mîrê Bizqê hatiye naskirin.

Li gor ku di gelek rûniştinan de, Seîd Yûsiv ji min re digot "Hêvî û daxwazên min ku ez paymangeheke muzîkê li bajarê Qamişlo vekim û xort û keçan fêrî muzîkê û hezkirina muzîkê bikim".

Koçkirina Dawî: Beyrût, Stenbol û Qamişlo

Di roja 26/2/2020an de dema ku min nûçeya koçkirina Seîd Yûsiv (Mîrê Bizqê), bihist ku li



û Cegerxwîn û Mihemed Şêxo deynin, ji me re sirûdên evînê bibêjin. Erê sirûdên evînê.

Berî ku bimre bi dor salekê, ew di Havîna 2019an de, ji Beyrûtê hat mala xwe a li Qamişlo, dor heyvekê li Qamişlo ma û careke din zivîrî Bayrûtê. Ev hatina wî a dawî bû. Li gor ku jin û zarokên wî ji min re gotin; "Di roja 24/10/2019an de, me li Beyrûtê bihist ku mamoste Hemîdê Derwêş çûye ber dîlovanîya Xwedê. Berê jî Seîd nexweş bû, dema ku wî jî bihist Hemîd miriye, êdî nema rabû ser xwe, nema meşiya, nexweşiya penceşêrê bêtir zor lê kir. Hez ji Hemîdê Derwêş dikir. Me ew şanî doktorên wî li Beyrûtê kir. Paşê me ew bir nexweşxaneyêke Stenbolê. Ta ku di roja 26/2/2020an de, canê xwe ji dest da û cû ber dîlovanîya Xwedê.

Piştî ku nûçeya mirina wî belav bû, Hikûmeta Herêma Kurdistanê, xwe da ber anîn û xerciya guhestina termê wî ji Stenbolê bo Qamişlo. Sibeha 1/3/2020, ez û birrek ji nivîskar û hunermendan çûn ser çemê Dicle (Sêmalika/ 100Km ji Qamişlo dûre), dergehê sînor di navbera Rojava û Başûr de, me pêşwaziya termê wî kir û anî Qamişlo, ew di goristana taxa Qidûr Beg de sipart axa sar û cemidî. Hêjayê gotinê ye, ji welatparêzên kurdan yê ku di vê goristanê de hatine veşartin: Mela Ehmedê Namî yê xwediyê sirûda Pêşkevin Em Serfiraz in Mîletê Kurdî, Şêx Maaşûqê Xiznewî, Kemal Derwîş, Şêxmûs Ehmed, Siyamend Îbrahîm û gelekên din. Roja îro, gora wî jî li Qamişlo wek gora Cegerxwîn û Mihemed Şêxo bûye meqseda serdana welatparêzên Kurda.

Sed mixabin, ew pêşwaziya cemawerî ku ji Cegerxwîn re di sala 1984an de û ji Mihemed Şêxo re di sala 1989an de hat kirin, wek ku ji Seîd Yûsiv re pêdivî min nedît! Vê yekê dilê min şikenand!

Konê şîniya wî li Qamişlo, taxa Xerbî li ber dergehê mala wî hat danîn, Sê rojan dirêj kir. Sê rojan min û kurê wî Zoro pêşwaziya serdêrên şîna bavê wî kir. —Her du birayên wî yê din nikarîbûn amade bibin, Şahîn li Almaniya bû û Lawîn li Beyrûtê bû, bi tenê diya wî û xwîşkên wî hazir bûn— Ew serdêrên ku hatin şûn û şîna Seîd Yûsiv ji tev texlît ol û netewên Cizîrê bûn; ji Kurd, Erebi, Sîryan, Ermen û Êzidî bûn.

Dawî dibêjim: Her wê muzîkjen Seîd Yûsiv, bimîne dost û ez ê li dengê wî, gotinên helbestên wî, perçeyên muzîkjenîya wî guhdarî bikim. Her wê bimîne kaniya helbest û awazan. Her wê bimîne Mîrê Tembûrê û fexra muzîka Kurdî. Mirin pê nediket. Lê qeder jî kar û barê xwe dike. Belê wek ku kurdan gotiye: "Ga dimre çerm dimîne, mêr dimre nav dimîne".

## LÜĞƏTLİ ƏLİFBA-ALFABÊYA BI FERHENG

Aa



av

Ev çîye? Ev **ave**.  
Bu nədir? Bu sudur.  
Что это? Это вода.  
What is it? It is water.




diran

Ev çîye? Ev **dirane**.  
Bu nədir? Bu dişdir.  
Что это? Это зуб.  
